Şopdara Rastiyê ye
# Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar :873 20-Hezîran- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165




## Ev hesp bijîşk e



Me hemûyan bihîstiye ku ajel bi awayekî terapîst dixebitin û mirovan baş dikin. Hespê bi navê “Peyo” yê 15 salî demeke dirêj e rojên xwe li Nexweşxaneya Calais ya Fransa derbas dike û nexweşên penceşêrê baş dike. Xasma mirovên pir extiyar bextiyar dike.

Peyo destpêkê ji bo pêşbirkan hatiye perwerdekirin lê xwediyê wî piştî demekê dîtiye ku hin hunerên wî yên din hene. Piştî pêşbirkê Peyo her tim ber bi mirovan ve çûye û xwestiye li gel wan bisekine. Xasma jî kesên nexweş hildibijêre û xwe pirtir nêzî wan dike. Paşê jî xwediyê wî biryarê dide ku Peyo ji pêşbirkên hespan dûr bixe û bi nexweşên pêdiviya wan pê heye, bide naskirin.

Peyo êdî li nexweşxaneyê bi “Bijîşkî” tê naskirin. Peyo diçe ber deriyê nexweşan û piyê xwe bilind dike. Dema piiyê xwe bilind dike, xwediyê wî fêhm dike ku Peyo dixwaze bi wî nexweşî re wext derbas bike û wî bextewar bike. Hebûna Peyo ji bo nexweşan weke terapiyê ye. Nexweş xwe li gel Peyo bextewar his dikin û ji xemên xwe dûr dikevin. Xasma jî nexweşên penceşêrê.

***Ozgûr Polîtîka***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | ■ | Ş | A | M | ■ | | ■ | S |
| 2 | A | M | Û | R | ■ | S | ■ | A | Ê |
| 3 | M | Û | ■ | Î | N | S | A | N | ■ |
| 4 | E | S | A | ■ | Û | ■ | W | A | N |
| 5 | ■ | A | L | A | ■ | P | A | T | A |
| 6 | T | ■ | Ê | ■ | A | E | ■ | O | ■ |
| 7 | E | J | N | Û | ■ | R | O | M | A |
| 8 | ■ | A | C | ■ | H | E | D | Î | S |
| 9 | I | R | ■ | N | O | ■ | E | ■ | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 2 | ■ | | | ■ | | | | | ■ |
| 3 | | | | | | ■ | | | |
| 4 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 5 | ■ | | | | | | ■ | | |
| 6 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 7 | | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 9 | | | ■ | | | ■ | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Yezdanekî misrî... Dinya, cîhan
2. Cînava pirsiyariyê ya ku tê wateya; li kû ye?... Xwarinên ji şîr
3. Navçeyeke Agirî... Îrade
4. Bi soranî ‘av’... Rahibê Budayan
5. Her tiştê têkildarî debara jiyanê... Rêxistina polîsan ya Naziyan
6. Rojek... Pirsek di rewşa ne tewandî de
7. Kevir... Nexweşiyek
8. Ajela xwedîtêjik... Goştê diran tê de çikandî
9. Plakaya navneteweyî ya Tirkiyê... Li Colemêrgê gotina ‘yek’ê... Dijberê rengê spî

**JOR-JÊR**

1. Tevgera hewayê... Kurtebêja Antîmonê
2. Lehengê destana Newrozê... Temen
3. Sir, tiştê her kes pê nizane... Vexwarineke bi alkol
4. Mehek... Pirsek di rewşa tewandî de
5. Mehek
6. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tinekirin... Sindoqa xîz û tiştên wisa pê tên pîvan
7. Dua, niyaz... Plakaya navneteweyî ya Îranê
8. Cephe, bere... Beşeke malê, jor
9. Cureyekî zad ku piranî şorbe pê tê çêkirin... Kar û xebat

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Bac** | **Diravên ku dewlet di berdêla mal û milk de ji welatiyên xwe distîne: Baca xaniyan pir biha ye.** |
| Cirm | Standina bi darê zorê ya mal, milk yan jî diravan ji mirovan: Rêbiran em cirm kirin. |
| Firîşte | Melek, melaîket. |
| Koordîne (Fransî) | Ji bo xwegihandina armancekê pêkanîna girêdan, têkilî, rêxistin û ahengê di navbera çend karan de: X. karê kargehê koordîne dike. Koordînasyon. |
| Koordînator | Kesê karê koordîneyê pêk tîne. |
| Perû | Xelat, diyarî: A. saetek da B. got; ev perûya te ye. |
| Salewext | 12 meh: X. salewext cotkariyê dike. |
| Seranser | Ji serekî heta serê din. Tev, hemû: Ez li seranserê bajêr geriyam. |
| Seresere | Xemsarî. Girîngnedîtin: X. karê xwe seresere dike. |
| Rojev | Tiştên dibin mijara rojê: Di rojeva me ya îro de êrişên dagîrkeran hene. |

## Tûrikê çîvanokan

***Di tûrikê me de îro sirûda li ser welat heye. Ji bo mirovan welat weke dayîkê ye; çawa ku zarok bê dayîk nabin, mirov jî bêwelat nabin. Ji ber ku mirov xwîna xwe, goştê xwe, hestiyên xwe û bedena xwe bi giştî ji ax û erdê welatê xwe digire, welatê mirov pir şîrîn e. Welatên xelkê çiqas xweş bin jî welatê mirov ji yên her kesî xweştir e. Çawa ku dibêjin; “Mala pîrê xweştir e ji ya mîrê Cizîrê”. Em binêrin ka sirûda me ya li ser welat çawa ye.***




Welatê me Kurdistan
Ji Sêwasê ta Kerman

Çem û çiya û bostan
Tev de gul û gulistan

Şax û bax û şaristan
Dexl û dan û daristan

Qaz û qulingên zozan
Bûne dildar û hozan

Her çar alî seranser
Zêr û zîv û tev cewher

Mêrg û kanî fereşîn
Tev dîmen û şaneşîn

Warê Rustem kurê Zal
Yê Zerdeştê Pîrekal

Welatê xwe Kurdistan
Nadim bi sed Hindistan

# “Ji ber ku xebata Tevgera Azadiyê li dijî desthildaran e, êriş li ser dibin”



Li Zap, Avaşîn û Metîna, ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, ji 23`ê Nîsanê ve, gerîla bi têkoşîneke bêhempa li ber xwe didin. Li ser mijarê Rozelîn Bekir diyar kir ku êrişên li ser Herêmên Parastinê yên Medya dibin, berdewama komploya qirkirina gelê Kurd û tinekirina projeya demokratîk e. ***R-4***


Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 873 20-Hezîran- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## Bazên Zagrosê dîroka berxwedana jinê nû dikin





Gerîlayên jin li Avaşîn, bi çekên giran û sekvaniyê bi rengekî çalak tevlî şer dibin û rola wan diyarker e. Di rojnivîsên gerîla de jî diyar dibe ku di encama çalakiyên gerîlayên jin de heta niha derbên giran li leşkerên Tirk hatine xistin.***R-3***

# Kurdistan li ser sêla sor e

Li her çar beşên Kurdistanê jî hê pirsgirêka Kurdan ya man û nemanê çareser nebûye. Digel hebûna federasyona li Başûr, ji bo paşrojê garantiya wê jî nîne. Rojane di binê gefên dewletên dagîrker de ye. Jixwe nîvê wê hê di binê desthilatiya Iraqê de ye. Di rewşa heyî de piraniya Kurdan dihizirin ka wê hêzên derve ji bo wan çi bikin. Lê zû tê jibîrkirin ku herdem hêzên derve Kurd li ser piştê hiştine. Ji ber wê berî her tiştî divê neteweya Kurd bibîne ku Kurdistan di xetereke mezin de ye. Rakirina vê xeterê jî di destê Kurdan de ye. Ku ew jî yekîtiya neteweyî ye.



## Armanca gelacan pêk neynin




Li ser hewldana derxistina tevlîheviyê li Minbicê, şêniyên bajarê Qamişlo gotin, divê şêniyên Minbicê fêm bikin ku gelek aliyên derve dixwazin li herêmê bi derxistina tevlîheviyê armanca xwe pêk bînin. Ji ber wê divê li hemberî van hêzan bibin yek.***R-5***

## Êdî ne xewn e, ne xeyla e, rastî ye



Li Rojava îsal jî xwendekar ji bo xwendina zanîngehê ketin ezmûnê. Xwendekarên derketîn dibêjin, em kêfxweş in ku bi zimanê kurdî perwerde dibin û ev ji bo me cihê serbilindiyê ye. ***R-6***

## Koma Harmûnî û çalakiyeke hunerî



Koma Harmûnî çalakiyeke hunerî pêşkêş kir û tê de girêdana stiranên kurdî, erebî, suryanî û ermenî destnîşan kir ku tabloyeke hunerî û rengê herêmê diyar dike. ***R-7***


Gerîla doza jiyana xwebûnê ye — Gulîstan Xalid — R-3
Agirê Başûr... — Ednan Mustafa — R-4
ÇIMA QENDÎL? — Faruk Sakik — R-5
Nehêlin ti kes gulên baxê... — Sîpan Şînda — R-7

# “Divê li Hewlêrê yên bi azadî tev bigerin Kurd bin, ne çete”

Welatiyên Kurd siyaseta dijminatî ya PDK li dijî Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê û PYD’ê dike, şermezar kirin û gotin, divê Kurd li Hewlêrê bi azadî tev bigerin, ne çete.








Bertekên welatiyan yên li dijî siyaseta PDK’ê ya girtina nûnerên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) û nûnerên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê li Hewlêrê zêde dibin.
Hê çarenûsa nûnerên PYD’ê û Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ya li Hewlêrê di gel redkirina PDK’ê ya eşkerekirinê, ne diyar e.
Şêniyên navçeya Dêrikê ya Qamişlo sûc û kiryarên PDK’ê şermezar kirin. Girêdayî mijarê, Xelîl Hacî Mihemed wiha got: “Em dixwazin gelê Kurd bibe yek, eger em nebin yek emê bi tevayî zererê bibînin. Nabe ku em qîmet û nirx bidin biyaniyan û welatiyên xwe biqewitînin.”
Mutîi Remedan jî wiha got: “Ku çete bi azadî li Kurdistanê tev bigerin, ev kirêtiyeke mezin e. Divê Kurd li Hewlêrê bi azadî tev bigerin, divê Hewlêr çeteyan pêşwazî neke.”
Ebdullah Hemze jî da zanîn ku ji siyaseta PDK’ê ne matmayî ye û wiha got: “PDK hevrêyên me digire û radestî Tirkiyê dike. Berî niha jî tankên dewleta tirkî diajotin û niha jî dikin. Divê PDK li hesabê xwe vegere, piştgiriya dewleta tirkî neke û baregehan li Metîna ava neke.”
***ANHA***

## Agahî ji nûnerên PYD’ê û Rêveberiya Xweser nayê girtin

Hêzên PDK’ê 3 nûnerên PYDê û Rêveberiya Xweser ku ji bo pêşwazîkirina mêvanên xwe çûbûn balafirgeha Hewlêrê, girtine. 11 roj in aqûbeta kesên hatîn destgîrkirin, nayê zanîn.
Di 10’ê Hezîranê de nûnerê pêwendiyan yê PYD’ê yê Hewlêrê Mistefa Osman Xelîl, nûnerê Rêveberiya Xweser yê Hewlêrê Cîhad Hesen û Endamê PYDê yê Hewlêrê Mistefa Ezîz Mistê dema di saet di 03.00’an de diçûn pêşwaziya mêvanên xwe, li balafirgeha Hewlêrê, ji aliyê hêzên PDK`ê ve hatin girtin. Ji wê rojê ve aqûbeta kesên hatîn girtin, nayê zanîn.
Endamê Nûnertiya bakur û rojhilatê Suriye yê li Herêma Kurdistanê



Cemîl Rehmano derbarê mijarê de ji Rojnews re axivî. Cemîl diyar kir ku her 3 endamên nûnertiya Rêveberiya Xweser û PYD’ê, ji bo pêşwazîkirina mêhvanên xwe çûbûn balafirgehê, lê ji aliyê PDK’ê ve hatine destgîrkirin.
Herwiha Asayişa PDK`ê ciwanê ji Rojava yê bi navê Ciwan Ebdulkerîm El-Mihemed, destgîr kiriye û heta niha çarenûsa wî jî ne diyar e.

***ROJNEWS***

## Merasima bîranîna 92 şehîdên Hezîranê



**Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo ji bo bîranîna 92 şehîdên meha Hezîranê li Goristana Şehîd Delîl Sarûxan merasimek li dar xist.**

Di merasima bîranînê de malbatên şehîdan, endamên Rêveberiya Xweser, TEV-DEM, şêniyên Qamişlo û hêzên leşkerî amade bûn. Şehîdên hatîn bîranên di salên cuda de di meha Hezîranê de şehîd bûbûn. Şehîdên hatîn bîranîn cihê xwe di nava tevgera azadiyê û şoreşa 19`ê Tîrmehê de girtibûn.
Di merasimê de endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Wejdî Betê ku axivî berxwedana li Herêmên Parastinê yên Medyayê pîroz kir û da zanîn ku gortistana şehîdan rûmet û nasnameya wan e.
Wejdî Betê da xuyakirin ku yê riya şehîdên rizgariya Kurdistanê neşopîne nabe ku behsa neteweya Kurd bike. Herwiha endama Kongreya Star Roza Tolhildan axivî û tevayiya şehîdên tevgera azadiyê bîr anîn. Tolhildan diyar kir ku rojên tê re derbas dibin rojên dîrokî ne û got, ji bo ku em bikarin bibin ji şehîdên xwe re bibin bersiveke xurt divê em têkoşîna doza wan xurttir bikin.
Merasim bi slogana “şehîd namirin” bi dawî bû.
***ANHA***

## Li Kobanê merasima du şehîdan û merasima xiyabî ya 4 gerîlayan

**Bi sedan welatiyên kantona Kobanê cenazeyê şehîd Elende Mihemed û şehîd Ehmed Îbrahîm li Goristana Şehîd Dîcle ya li başûrê bajêr spartin axê. Herwiha merasima xiyabî ya 4 gerîlayên li herêmên cuda yên başûrê Kurdistanê li dijî artêşa tirkî li ber xwe dayîn û şehîd bûyîn li dar xistin.**

Meclisa Malbatên Şehîdan ya Herêma Firatê bi merasimekê cenazeyê endama Tevgera Şoreşger ya Komonîst şehîd Elende Mihemed (Zîlan Destan) ku 13`ê Hezîranê li Qamişlo di perwerdeyê de û cenazeyê şehîd Ehmed Îbrahîm (Ehmed) ku 12`ê Hezîranê li ser erkê xwe şehîd bûn, spartin axê. Merasima xiyabî ya 4 gerîlayan jî hat lidarxistin.
Bi sedean welatiyên kantona Kobanê, nûnerên Rêveberiya Xweser, saziyên civaka sivîl û hêzên leşkerî di merasimê de amade bûn.
Di merasimê de serokê Meclisa Leşkerî ya Kantona Kobanê Ismet Şêx Hesen axivî û got, em li hemberî wêneyên têkoşerên ku sînoran nas nakin û ji bo azadiya vî gelî derbas kirine, sersaxiyê ji malbatên şehîdan re dixwazin û em çi ji wan re bikin jî em nikarin mafên wan bidin. Lewra tişta herî giranbiha feda kirin.”



Şêx Hesen di dawiyê de bang li gelê Kurd kir ku parastina destkeftiyên şehîdan bikin û got, lewra şehîd li hemberî dijmin mertal bûn, lê kesên ku destên xwe dixin destên dijmin ew kesên ku xiyanetê li gelê Kurd dikin û divê ew riya rast nas bikin.
Piştî axaftinan cenazeyê şehîd Elend Mihemed El-Sera li Goristana Şehîd Dîcle, yê şehîd Ehmed Îbrahîm jî li gundê wî Şemis El-Dîn hatin veşartin.
Merasima xiyabî jî ji gerîlayên li dijî artêşa tirkî li başûrê Kurdistanê li ber xwe dayîn û şehîd bûyîn li dar ket. Navên şehîdan wiha ne: Şehîd Sarya Mehmûd (Sarya Çiya), 8`ê Gulanê li Avaşîn, şehîd Xerîb



Delê (Azad Dilbirîn), 8`ê Nîsanê li Besta, şehîd Mehmûd Qadir (Çiyager Amed), 31`ê Gulanê li Cîlo, şehîd Heysem Şêxo (Demhat Kobanê), 15`ê Hezîranê li Metînayê şehîd bû.
***ANHA***

## Di Gerîla TV de dimenê çalakiya gerîla ya li Avaşîn

**Gerîla TV dîmenê çalakiyên gerîla yên bi çekên giran li dijî artêşa tirkî ya dagirker li Avaşîn hatîn kirin, weşand.**

Di dîmenan de yên ji aliyê Gerîla TV ve hatîn weşandin, çalakiyên ku bi roketên hawanê hatine kirin, tê dîtin. Dîmen yê çalakiyan e ku di rojên cuda de hatine lidarxistin.
Di dîmenê 2.30 deqeyan de bombebarana bi hawanan xuya dike. Herwiha li nuqteyekê jî berî çalakiya bi hawanan, ji cîhazê ragihandinê yê gerîla dengê ‘Serketin ya me ye’ tê bihîstin.



Piştî deqeya duduyan jî tê dîtin ku roketek li nava gelek leşkeran dikeve. Yên li ser girekî li hev civiyane. Piştî teqînê gelek leşker ji hev belav dibin û direvin.
***https://1452214184.rsc.cdn77.org/video/2021-06-18-gerillatv-calakiyen-ceken-giran-avasin-1.mp4***



# Koma Harmûnî û çalakiyeke hunerî

Koma Harmûnî çalakiyeke hunerî pêşkêş kir û tê de girêdana stiranên kurdî, erebî, suryanî û ermenî destnîşan kir ku tabloyeke hunerî û rengê herêmê diyar dike.

Bi piştgiriya ya Desteya Ciwanan û Werzişê ya Herêma Cizîrê, Koma Harmûnî çalakiyeke hunerî li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya bajarê Qamişlo pêşkêş kir û bi dehan ciwan û jinên ciwan pê kêfxweş bûn.
Koma Harûmî ji aliyê hunermend Harotyon Madarjiyan ku dema çeteyên DAIŞ`ê Reqa dagîr kirîn, ji wir koçî bajarê Qamoşlo bûye û li vir peymangeha bi navê Peymangeha Harmûnî ya Muzîkê vedike.
Di peymangehê de koma bi nave “Harmûnî” ava kir û tê de ciwanên Kurd, Ereb, Suryan û Ermen hene..
Vê komê çalakiyeke hunerî ku tê de tevayiya zimanên gelên bakur û rojhilatê Sûriyê hatine diyarkirin, pêşkêş kir.
Harotyon Madarjiyan ku berpirsê vê komê ye ev agahî dan: “Piştî peymangeh di salekê de hat pêşxistin, min xwest komekê ji xwendekarên peymangehê çêkim û min navê wê kir Harmûnî. Dema ez hatim Qamişlo, min dît ku welatiyên Eereb, Kurd, Suryan, Ermen û Asûr bi hev re dijîn û sedema navlêkirina komê ew bû ku girêdana gelên herêmê nîşan dike.”
Harotyon Madarjiyan diyar kir ku koma Harmûnî stiranên kurdî, eremenî, suryanî, asûrî, merdelî û erebî pêşkêş dike. Lewra mîrateya herêmê ye û armanca me bi riya vê hunerê yekîtiya gelan e û mûzîk



jî zimanê cîhanê ye.
Harotyon Madarjiyan axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Her yek bi hunera xwe xwediyê peyamekê ye. Peyama me ya bi riya vê hunerê ew e ku em ji cîhanê re bêjin em bi Kurd, Ereb û Suryaniyên xwe ve li welatekî dijîn û ev e mûzîka me ya hevbeş e.”
***ANHA***

## Li bakurê Kurdistanê kampanyaya zimanê kurdî

**Rewşenbîr û nivîskarên Rojavayê Kurdistanê piştgiriya xwe ji bo kampanyaya zimanê kurdî ya li bakurê Kurdistanê nîşan dan û diyar kir ku kampanya ji bo wan cihê serbilindiyê ye.**

21`ê Sibatê Platforma Zimanê Kurdî û Tora Ziman û Çanda Kurdî li bakurê Kurdistanê bi navê “Bila zimanê kurdî bibe zimanê fermî û zimanê perwerdeyê” kampanyayeke îmzeyan dan destpêkirin. Heta niha gelek aliyên têkildar, herwiha partiyên siyasî yên bakurê Kurdistanê tevlî kampanyayê bûne. Lê çalakiyên vê kampanyayê ji aliyê polîsên dewleta tirkî ve tên astengkirin.
Têkildarî mijarê serokê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê û mamosteyê wêjeya kurdî yê Zanîngeha Rojava Welîd Bekir diyar kir ku piştgiriya kampanyaya ji bo zimanê kurdî li bakurê Kurdistanê dikin û wiha axivî: “Dewleta tirkî ya dagîrker




ji destpêka avabûna xwe ve siyaseta qirkirin û pişaftinê li ser gelê Kurd li bakurê Kurdistanê dimeşîne. Lê di gel vê siyastê nikarîbû çand û zimanê gelê Kurd tine bike.
Bekir diyar kir ku bi hêvî ne kar û xebata ji bo zimanê kurdî li bakurê Kurdistanê bigihîje encameke baş.
Welîd Bekir da zanîn ku di wê baweriyê de ne ku têkoşîna ji bo ziman dewam bike û got, tekoşîna gelê bakurê Kurdistanê têkoşîneke pîroz e.
Li aliyekî din berdevkê fermî yê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê Gulal Kasanî jî da zanîn ku dewleta tirkî ya dagîrker di dirêjayiya dîrokê de her dem bi siyaseta xwe




ya şovînîst li hemberî neteweya Kurd bi kar tîne û wiha dewam kir: “Dewleta Tirk hem li bakurê Kurdistanê, hem li derveyî Bakur şerê Kurdan dike. Dewleta tirkî bi wedexekirina ziman şerê hebûna Kurdan dike.”
Kasanî diyar kir ku kampanyaya ji bo ziman hatî destpêkirin li cem wan cihê serbilindiyê ye û got, em nivîskarên Rojava vê gavê erênî dinirxînin.”
Kasanî wiha li axaftina xwe zêde kir: “Di dirêjayiya dîrokê de tevî



siyaseta bişaftinê, sitemkarî û dagîrkeriyê jî gelê Kurd zimanê xwe parast.”
***ANHA***

## Pêşangeha Pirtûkan ya Şehîd Herekol di nêz de vedibe

Komîteya Amadekar ya Pêşangeha Pirtûkan ya Şehîd Herekol amadekariya pêşangeha xwe ya 5`an dike. Îsal wê gelek weşanxane ji welatên Ereban û ji her çar beşên Kurdistanê tevlî bibin.

Pêşangeha Pirtûkan ya Şehîd Herekol wê bi durişma “Pirtûk rehjena jiyanê ye” 29`ê Tîrmehê li Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya Qamişloyê were vekirin.
Pêşangeh ji aliyê Desteya Çand û Hunerê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ve ji salên borî firehtir tê organîzekirin. Li gorî çavdêrên pêşangehê gelek weşanxane ji gelek welatên Ereban û ji her çar parçeyên Kurdistanê tevlî dibin. Di pêşangehê de wê semîner ji sala borî pirtir werin dayîn. Tê payîn ku pêşangeh 8 rojan bidome.
Amadekariya vekirina pêşangehê bênavber didome. Derbarê mijarê de cîgira Desteya Çand û Hunerê ya bakur û rojhilatê Sûriyê Ronahî Hesen ev agahî dan: “Ev demek e me dest bi amadekariyê kiriye. Me komîteya amadekar ava kir ku nêzî mehekê ye têkilî bi weşanxaneyan re daniye û ji wan re vexwendnameyên tevlîbûna pêşangehê dişîne. Ji bo ku tevlî bibin jî ji wan re hêsaniyan pêşkêş dike. Herwiha hola pêşangehê jî li gorî weşanxaneyan tê amadekirin. Komîteya Amadekar wê pêngava danasîna pêşangehê bi rê ve bibe.”
Ronahî axaftina xwe wiha domand: “Îsal wê tevlîbûn pirtir be. Wê ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û hundirê Sûriyê, ji beşên din yên Kurdistanê û ji welatên Ereban mîna Lubnan, Misir, Tûnis, Iraq û Îmaratê gelek weşanxane di pêşangehê de cih bigirin.”
Li gorî Ronahî heta niha 25 weşanxaneyên ji derveyî herêmê diyar kirine ku wê bi riya wekîl, sazî û pirtûkxaneyan tevlî pêşangehê bibin.
Ronahî da zanîn ku derî hê li pêşiya weşanxaneyan vekirî ye û wiha axivî: “Desteyê roja 15`ê Hezîranê roja dawî ya pêşkêşkirina daxwaznameyên tevlîbûnê diyar kir.”
Têkidarî beşên nû di pêşangehê de Ronahî da zanîn ku wê beşên mîna pirtûkên hiqûqî û pirtûkên xwendekarên Zanîngeha Rojava hebin.
Girêdayî giliyên ku sala borî bihayê pirtûkan gelek giran bû, Ronahî ev agahî parve kir: “Emê hewl bidin bihayê pirtûkan kontrol bikin da ku her kes bikare bikire.”
Ronahî da xuyakirin ku hewl didin balê bikişînin ser girîngiya rola xwendinê.



Mîna sala borî desteyê di çarçoveya pêşîgirtina li vîrûsa koronayê de gelek tedbîr girtine. Têkildarî wê Ronahî da xuyakirin ku têkilî bi Desteya Tenduristiyê re danîne da ku tedbîrên pêwîst bigirin.
Pêşangeh cara yekê 20`ê Tîrmeha 2017`an hat vekirin. Pêşangeh ji bo bîranîna têkoşer û nivîskar şehîd Hisên Şawîş (Herekol) tê vekirin. Lê îsal ji ber cejna Qurbanê wê ne di heman dîrokê de were vekirin.
***ANHA***



## Nehêlin ti kes gulên baxê we biçilmisîne

Sîpan Şînda

Demsalên welatê min veguherîne. Zivistana reş û tarî dîsa konê xwe li ser welatê min vegirtiye. Ewrên reş û tarî li hev dicivin, her peleyek ewrê reş li kû dera dinyayê hebe berê xwe daye welatê min û li raserî wî kom dibin. Wê ewrên xumam tev li raserî welatê min kom bibin û berf û baranê, ba û badevê li ser welatê min bibarînin. Xwedayên xezebê li hev civiyane û tevayiya ewrên xezebê li ser welatê min de rêkirine. Ew ewrên ba, badev û tofan jê diweşin. Dengê xurexura esmanan stêrkan dirijînin, xewê li milyaketan diherimînin. Terqîna dengê birûskên li zinar û lûtkeyên çiyayên welatê min dikevin, perikê guhên mirovan diteqînin, kerran kerrtir dikin. Birqên belediyên ji nava wan ewrên xumam derdikevin, pey xwe de xurexur û lêhiyan tîne. Her terqîna birûskekê hiznê têxe di nava gelî û newal, çiya û zozan, gund û bajarên welatê min.

Li welatê min demsal mirî ne, bihar mirî ye, kanî û robar mirî ne, bax û bostan mirî ne, havîn mirî ye, av û avî mirî ne, dehl û dir mirî ne, mişk û mar mirî ne, xweza mirî ye, jiyan mirî ye jiyan. Tovê jiyanê li welatê min hatiye reşandin, lêbelê hatine jehrîdan û nahêlin şîn bibe, geş bibe, gur bibe, xwezayê vejîn bike, kanî û robaran der bike, deşt û çiyan bixemilîne. Xemla gir û baniyên welatê min sosin û beybûn in, nêrgiz û lîloz in, binevş û berfîn in, guldexwînên xemgîn in, gulên sor û zer û xemrî ne. Erê gulên bi bêhn in, bi xeml in, bi rewş in. Gulên li ber bêhna evîndaran, gulên li ser guliya sewdaseran, gulên di hembêza kezeb şewatan. Gulên sînca bax û bostanan, dehl û rezan, sebra dilê aşiqan, hêvî û xeyalên sêwiyan.

Dengê qîjîna teyrê baz êdî di geliyên kûr û dirêj de deng venade, pîrte pîrta pezkoviyan û terqîna şaxên wan yên qoç ji ser hewalên bilind nema hizûrê berdide di gorên hezar sale de. Li dora xwe di nêrim, li hewalên bilind, li dolên hûnik, li ber tehtên tavê nabînin, li nizarên xewle di nêrim, lê belê keviyên berfê nema xwiya dikin. Ew keviyên berfê yên çar demsal li serê zozanan di heyîva temîz û tebaxê de qebûqebû ji tîrêjên tavê re dikirin tev heliya ne. Ma ne bese wa ewrên reş û tarî, wa ewrên xezebê, wa kumikên belayê, wa neyarên keyf û xweşiyê, wa ewrên jehriyê di barînin, ma ne bese! Êdî belav bibin ji ser welatê min, herin, dûr bikevin, nema birûskên xwe li teht û zinarên çiyayên poz bilind bidin. Bila êdî bihar bê welatê min, bila kulîlkên welatê min bêhna xwe di ser geliyên kûr de berdin. Bila gulên welatê min bê av nemînin. Bila kulîlkên baxan ne çilmisin. Li gulên baxê xwe xwedî derbikevin û ne hêlin ti kes wan biçilmisîne.

# Êdî ne xewn e, ne xeyla e, rastî ye

**Li Rojava îsal jî xwendekar ji bo xwendina zanîngehê ketin ezmûnê. Xwendekarên derketîn dibêjin, em kêfxweş in ku bi zimanê kurdî perwerde dibin û ev ji bo me cihê serbilindiyê ye.**



Tevî ku gelê Kurd li Sûriyê pêkhateya herî mezin e, mixabin bi salan gelê Kurd li rojavayê Kurdistanê ji aliyê hikûmeta Şamê ve, ji mafê perwerdeya bi zimanê Kurdî hatibû bêpakirin. Lê îro rewş guheriye. Bi Şoreşa 19`ê Tîrmehê re gelê Kurd dest bi avakirina pergala perwerdeyê jî kir. Ji bo perwerdeyê materyal hatin amadekirn û dersên zimanê Kurdî hatin dayîn. Piştî Efrîn û Kobanê, xwendevanên refa 9 û 12`an yên herêman Cizîrê jî îsal (sala xwendinê ya 2020–2021) dest bi ezmûnên wekhev kirin.

Têkildarî pergala dibistanan û guhartina tevayiya materyalên bi zimanê dayikê ji aliyê komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk ya Rêveberiya Xweser û çêkirina ezmûnên wekhev ji bo ref 9 hata 12`an li herêma Cizîrê, lêkolîner û nivîskar Salihê Heydo axivî. Heydo li Zanîngeha Rojava dersan dide. Salihê Heydo bal kişand ser girîngiya ziman û got, xwendekar hem bi zimanê xwe perwerde bûne, hem di dîrok û erdingarîya xwe de hîn bûne. Ev jî di paşrojê de wê serketinê ji wan re bîne.

Xwendekarê refa 12'an Diyar Hisên jî got, xwendina bi zimanê xwe, ji bo me xewnek bû. Lê îro em gihîştine van daxwaziyênn xwe.

Li aliyekî din xwendekara refa 9`an Sîdra Umer got, ez gelek kêfxweş û serbilind im. Ez kêfxweş im ku ev karta ezmûnan bi zimanê Kurdî gihîştiye min." Sîdra wiha li axaftina xwe zêde kir: "Ez spasiya Rêveberiya Xweser dikim, li ser pêşkêşkirina vê gavê ji bo me, em keda mamosteyên xwe ji bîr nakin. Lewra mamosteyên me gelek ked di ber me de dan. Di vê demê de heta di navbera dibistanan de jî bi me re alîkar bûn."

***ANHA***

# Kêmkirina ava Firatê bandoreke mezin li çandiniyê dike

**Berpirsê Nivîsgeha Xebitandina Stasyonên Avê ya Komîteya Çandiniyê ya Meclisa Sivîl ya Reqayê diyar kir ku komîteyê rêjeya erdên çandiniyê ji bo sebzeyên havînê kêm kiriye da ku cotkar zererê nebînin. Lewra ava Firatê ji aiyê Tirkiyê ve hatiye kêmkirin.**



Ji ber kêmkirina ava Firatê, rojbiroj li kenarên ava Firatê êşa cotkaran pirtir dibe. Nexasim havînê qutkirina avê ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve bû sedem ku cotkar hilberînên havînê yên weke garisê zer neçînin.

Piraniya welatiyên bakur û rojhilatê Sûriyê bi giranî debara xwe bi çandiniyê dikin. Her sal cotkanên van herêman garisê zer diçandin. Lewra lêçûna wê kêm e û berhema wê baş e.

Lê ji ber qutkirina ava Firatê ji aliyê dewleta tirkî ve, Nivîsgeha Avê ya Komîteya Çandinî û Avê ya Meclisa Sivîl ya Reqayê biryar da ku rêjeya rûbera erdên çandiniyê yên havînê, nexasim çandina garisê zer kêm bike.

Têkildarî mijarê serokê Nivîsgeha Xebitandina Stasyonên Avê Şêx Nebî got, miqdara avê pir kêm e û têra erdên çandiniyê yên li bajarê Reqayê û gundewarên wê nake. Ji ber wê me agahî da kooperatîfên bajarê Reqayê û gundewarên wê ku li herêmê çandina garisê zer kêm bikin.

Şêx Nebî da zanîn ku li Reqa û gundewarê wê rûbera erdan 92 hezar hektar e û berî ku rêjeya ava Firatê kêm bibe di saniyê de 85 metrekab dihat berdan. Lê niha 65 metrekab av tê berdan û ev jî têrê nake.

Şêx Nebî bal kişand ser hilberîna zebeş û kunciyan û wiha axivî: "Pêwîstiya wan zêde bi avê nîne.



Ji ber wê em bang li cotkarên xwe dikin ku van hilberînan biçînin. Lê garisê zer gelek avê dixwaze û eger li tevayiya erdan were çandin, wê av têrê neke."

Di dawiyê de Şêx Nebî bang li rêxistinên mafên mirovan û dewletên cîhanê kir ku destwerdanê bikin û pirsgirêka ava Firatê çareser bikin. Lewra dewleta tirkî qutkirina ava Firatê didomîne. Wê ev jî li herêmê bibe sedema qewimîna bobelateke jîngehî û mirovî.

***ANHA***

# Li Herêma Firatê ji bo avê çareyên nû

**Piştî qutkirina ava çemê Firatê ji hêla dewleta tirkî ya dagîrker ve, kêmbûna rêjeya avê û derketina stasyona Tawî bi zêdetirî 4 mehan ji xebatê Yekîneya Avê ya El-Cerniye ya gundewarê Tebqa 2 pompeyên avê ji stasyonê re anîn.**



Şêniyên herêma hawizê Firatê êşa qutkirina avê ji hêla dewleta tirkî ya dagîrker ve dikişînin ku bandorê li tevayiya qadên jiyanê dike. Nexasim li peydakirina ava vexwarinê dike.

Ji ber kêmbûna rêjeya ava Firatê zêdetirî 30 stasyonên avê ji xizmetê derketin. Ji ber ku ava çem miçiqiye û rûbereke mezin jê ziwa bûye, di encamê de bi milyonan kes ji ava vexwarinê bêpar mane. Bi taybetî niha demsala havînê ye.

Yekîneya Avê ya El-Cerniye ya gundewarê Tebqayê berî niha gelek hewldan kiribûn ku li stasyona Tawî ya ava vexwarinê 2 pompeyan daynin. Ew jî piştî ku 4 mehan ji xizmetê derket û pê re aloziyeke mezin ji welatiyan re çêkir, pêk hat.

Şêniyên herêmê zehmetiya peydakirina avê, anîna avê ya bi sehrîcan û kişandina boriyan ji yên berê re kişandin. Lê pişt re Yekîneya Avê ya El-Cerniye tedbîrên pêwîst girtin.

Têkildarî mijarê Hevserokê Yekîneya Avê ya El-Cerniye Mehmûd El-Kelah ev agahî dan: "Bi çareseriyên altarnatîf yên ji bo sivikkirina bar li ser welatiyan û pedakirina ava vexwarinê xebatên me berdewam in."

El-Kelah ev li gotina xwe zêde kir: "Me li stasyonên Tawî yên girêdayî herêma El-Cerniye du pompe danîn ku cihê pompeyên stûnî bigirin. Ew pompe bi pîvana 100 hespî û bilindbûn 140 û xurtbûna wan jî 260 e."

El-Kelah diyar kir ku pompe ji derveyî hin mezreeyên li derdora gundên El-Cerniye, derdora ji 15 heta 18 gundewarên El-Cerniye avê dide.

Yekîneya Avê ya El-Cerniye pompeya Şemis El-Dîn sererast dike. Lewra li herêmê çavkaniyeke sereke ye û avê dide derdora 165 gundên li zêdetirî 75 km belav in.

***ANHA***

# "Xwedîderketina li zimanê dayîkê hebûn e"

**Mamosteyên zimanê Kurdî yên tevlî perwerdeya branşan bûne der barê perwerdeyê û girîngiya pêşxistina zimanê Kurdî de wiha gotin: "Armanca me ji vekirina perwerdeyan xurtkirina asta mamosteyan e her wiha em dixwazin bi vê yekê kêmasiyên salên borî derbas bikin."**

Bi armanca pêşxistina asta mamosteyan di aliyê branşan de, her sal di betlaneya dibistanan de Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-D) perwerdeya branşan ji mamosteyan re vedike. Li taxa Şêx Meqsûd a bajarê Helebê nêzî 145 mamosteyên zimanê Kurdî û Erebî perwerdeyên branşan dibînin. Perwerde ji dîroka 1'ê Hezîranê ve dest pê kiriye û heya du mehan wê berdewam bike. Perwerde ji aliyê mamosteyên pispor ên her branşek ve tê dayîn. Têkildarî girîngiya dayina perwerdeyê û pêşveçûna wê, mamosteyên zimanê Kurdî yên tevlî perwerdeyê bûne nêrîna xwe anîn ziman û ji me re parve kirin.

### Armanc pêşxistina asta zanebûna mamosteyan e

Rêveberiya Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-D) Zehîde Mihemed da zanîn ku ev perwerde bi armanca pêşxistina asta mamosteyan hatiye vekirin û wih pê de çû: "Ev 3 hefte ne me dest bi perwedeya branşan kiriye, ji bo em zimanê xwe bi pêş bixin û bigihîjînin asteke bilind pêwîstiya me bi perwedekirina ziman her tim heye. Hemû mamosteyên me yên cihê xwe di dibistanan de digrin û waneyan didin tevlî perwerdeya branşan bûne. Perwerdeyên em dibînin li ser branşên; felsefe, civaknasî, dîrok, erdnîgarî, fizîk, bîrkarî û hemû waneyên di dibistana de tên dayîn. Armanc ji vê perwedeyê ew e ku asta zanebûna mamosteyan zêdetir bibe her wiha kêmasiyên sala borî dubere nebin û mamosteyên xurt werin avakirin. Bi perwerdeyê em tenê branşan esas nagirin, di serî de mamoste di keseyeta xwe de lêvegerekê çêdikin û aliyên xwe yên lawaz xurt dikin. Ji ber mamoste bandoreke pir mezin li şagirtên dibistanan dikin û avakirina kesayetên nifşên pêşerojê erk û misyona wan e. Em bi hêvî



ne perwerdeyên me serkeftî bin."

### Xwedîderketin li zimanê kurdî

Di dawiyê de Zehîde banga xwedîderketina li zimanê dayikê kir û ev tişt got: "Zimanê Kurdî ji dîrokê heya roja îro di qonaxên qirkirinê re derbas dibe, heya niha gelek alî hene dixwazin zimanê Kurdî ji holê rabikin û di nava xwe de bihelînin. Banga me jî ew e xwedîderketineke mayîdne li zimanê me hebe û hemû alî xwe berpirsyarên vê yekê bibînin."

### 'Perwerde jêdera girtina agahiyan e'

Mamosteya bi navê Bêrîvan Îbiş tevlî perwerdeya branşa dîrokê bûye der barê pêşveçûna perwerdeyê de wiha nêrîna xwe anî ziman: "Betlaneya dibistanan di havînê de ji me re derfeteke pir girîng e ku em ji nû ve mêjiyê xwe sererast bikin. Piştî saleke têr û tijî pêwîstiya me bi hînbûnên nû heye. Ez bi xwe perwerdeyê li ser branşa dîrokê dibînim û perwerdeya me pir xweş derbas dibe. Dema em pirtûkekê xilas dikin, ji me re weke ezmûn tê çêkirin, da em asta xwe bizanibin û sûd jê bigrin. Pirtûkên em perwerdeyê li ser wan dibînin gelek agahî di wan de hene, bi rastî dema mirov perwerdeya xwe bi dawî dike dikeve ferqa wê û bi xwe re guhertinên bingehîn dide avakirin."

### "Armanca me fêrkirineke rast û zanistî ye"

Mamoste Nazliyê Oso jî branşa wê felsefe ye, der barê wê de wiha nêrîna xwe anî ziman: "Hemû mamoste bi coşeke pir mezin tevlî perwerdeyê bûne. Beşa min felsefe ye û pir agahiyên fireh tê de hene, ji ber felsefe dayika hemû zanistan e. Armanca me ji van perwerdeyan ne tenê em li pêşiya şagirtan bisekinin û tiştên me girtî ji wan re bêjin, em dixwazin bi awayekî zanistî tehlîl û lêkolîn bikin. Armanca me fêrikirinake rast û bi zanist e. Em hêviyên serkeftinê ji hemû mamosteyan re dixwazin."

***JINHA***



# Bazên Zagrosê dîroka berxwedana jinê nû dikin

**Gerîlayên jin li Avaşîn, bi çekên giran û sekvaniyê bi rengekî çalak tevlî şer dibin û rola wan diyarker e. Di rojnivîsên gerîla de jî diyar dibe ku di encama çalakiyên gerîlayên jin de heta niha derbên giran li leşkerên Tirk hatine xistin.**

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

Di gelek çalakiyên li dijî tevgera leşkerî ya dagîrkeriya artêşa tirkî de, gerîlayên YJA Starê mohra xwe lê dane. Pêngava Bazên Zagrosê, bi bawerî û îradeya van jinên pêşengên tekoşîna azadiyê 'mezin dibe, geş dibe'.

Di rojnivîa gerîla de jî dîyar dibe ku li hemberî dagîrkeriya hovane ya dewleta tirkî gerîlayên jin hem di sekna xwe ya di jiyanê de, hem jî




di çalakiyên li hemberî dagîrkeriyê de pêşengiyeke dîrokî dikin.

Di rojnivîsa gerîlayekê de wiha tê gotin: "Hevalên jin ji destpêka tevgera dagîrkeriyê ve bi enerjiya xwe, bi moral û fedakariyeke mezin pêşengî kirin."

Herwiha gerîlayeke din dibêje, bi taybetî rola hevalên jin yên şehîd di berxwedanê de diyarker bû, ji bo me rê nîşan dan."

Di rojnivîsê de jî, Rûken û Sarya hatin destnîşankirin û wiha hat gotin: "Heta kêliya dawî, ew heval bêfikar tevlî vê berxwedanê bûn. Ev mînak yek ji hêmanên girîng bû ku Mamreşo van hevalan kir Mamreşo."


Heman rojnivîsê behsa berxwedana dîrokê ya gerîlayên jin dike û wiha dibêje: "Li Aris Farisê di şexsê Amara û Diyanayan de ruhê fedayîtiyê, li Mervanisê wêrekiya Ekînan ya li dijî Kobrayan, enerjî û moralê hevala Viyan ku hîmê bingehî yê çalakiyên me yên bi çekên giran bû, îradeya Ronahî, Nesrîn, Marya û Berfînan ku dema dengê çekan dibihîstin, li dijî dijmin bedena xwe kirin mertal ji bo hevalên xwe, hevrêtiya xurt ya Tolvînan di dema herî giran ya şer de, gelo wê çawa bê jibîrkirin? Ev berxwedan bi van jinan navê xwe li dîrokê dinivîse. Pêngava Bazên Zagrosê bi bawerî û îradeya van jinan mezin dibe, geş dibe."

Jinên leheng bi şûrê azadiyê destanan dinivîse

Di rojnivîseke din de jî, li ser sekna diyarker ya gerîlayên jin ya li dijî dagîrkeriyê û tirsa dijmin bal tê kişandin û wiha dibêje: "Sekna hevalên jin roja destpêkê xwedî berpirsyar bû. Bi vê yekê erka vî şerî hildan ser milê xwe û xwe ji fedakariyê ti carî nedan alî. Ev helwesta wê bi qasî ku meşa vê tevgera dagîrkeriyê biguherîne bi



bandor bû." Nivîskarê rojnivîsê bi pirs berdewamiyê dide nîvîsa xwe û wiha dibêje: "Gelo ma di şerên heta niha de jî her tim ne bi vî rengî bû?" Dîsa ew bixwe wiha bersivê dide: "Aliyê cuda yê ji şerê berê ew e ku vê carê jin ne lehengên veşartî ne, bûne hêza herî li pêş ku ala serkeftinê li ba dikin. Ango ne sira li pişt serketinê ne, ew bûn serkeftin bixwe. Di nava vî şerê herî giran û dijwar de, li gel ewqas êş û azaran, rengê herî bedew yê jiyanê, hevalên jin in. Qiyamet jî rabe di kêliyekê de bêmoral nabin; her tim bicoş in û bi hêvî bi ser dijmin ve diçin. Çalakiyên sekvanî yên hevala Delîla bûn sedem ku dijmin ji terzîxaneyê vekişe, çalakiyên hawanan yên hevala Dîren û Dorşîn ku her roj di binê balafirên keşfê de dikirin û serketina heval Ekîn û Amara ya di



çalakiyan de, çeperên ku hevala Adîfe bi çeka B7 roxand, derbên giran li dijmin xistin. Herwiha ji bo me hemûyan bû hêzeke mezin. Van Hevalan bi gotina, 'Hevalno dijmin Avaşîn bi çeteyan dagirtiye, tirsa wan ya herî mezin ew e ku bi destê jinan bê kuştin. Wê çaxê ewê vê tirsê bibînin' biryara xwe nîşan dan. Heta niha bi idîa û hêviyeke mezin tevlî şer dibin. Şûrê azadiyê di şerê jinên leheng yên li Avaşîn de destanan dinivîse."

***Çavkanî:ANF***

# Xebata 7 salan ya Weqfa Jina Azad ya Sûriyê

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

Bi armanca bidestxistina mafê jinan Weqfa Jina Azad ya Rojava, bi durişma "Jina Azad Bingehê Civaka Azad e" 1`ê Îlona 2014an navendeke serbixwe ava kir. Bingehê kar û xebata weqfê piştgiriya projeyên jinan e. Çawa ku tê zanîn li Sûriyê bi taybetî li bakur û rojhilatê Sûriyê, Kurd, Ereb, Suryan û Asûr bi her re dijîn. Avakirina Weqfa Jina Azad ya Rojava hewl dide pirsgirêkên jin û zarokan ji aliyê civakî, çandî, tenduristî û aborî û hwd. ve çareser bike.

Ji ber ku weqfê kar û xebata xwe salbisal li seranserê Sûriyê berfireh kir, sala 2020an navê xwe kir Weqfa Jina Azad ya Sûriyê.



### SAZIYÊN WEQFÊ

Weqif bi avakirina saziyên xwe li bajaran kar û xebata xwe berfireh dike. Saziya weqfê ya sereke li bajarê Qamişlo ye. Yên din jî li van bajaran in; Tebqa, Reqa, Kobanê, Hesekê, Dêrikê, Girkê Legê. Herwiha ofîsên weqfê li kampên koçberan yên bi navê Hol, Roj, Newroz û Waşokanî jî hene. Berî ku bajarê Efrînê ji aliyê dewleta tirkî ve were dagîrkirin, weqif li wir jî dixebitî.

### QADA TENDURISTIYÊ JI MIJARÊN BINGEHÎ YÊN WEQFÊ YE

Ji ber ku qada tenduristiyê ji bo weqfê mijareke bingehî ye, gelek bernameyên tenduristiyê amade kirin. Mîna dayîna semîneran û vekirina dewreyên tenduritiyê ne. Jimara dewreyan 179 bû. Di van dewreyên tenduristiyê de, 2390 jin fêrî bingehê tenduristiyê bûn. Ji bilî wê, weqfê bi navê Arî navendên tenduristiyê li bajarê



Qamişlo û Hesekê vekirin. Herwiha venêrînxaneyên gerok yên çêkirina dermanên ser desta li Dêrik û Dirbêsiyê bi heman navî (Arî) vekirin.

### PERWERDEKIRINA JINAN

Ji bo hişyarkirin û perwerdekirina jinan têkildarî şideta li ser jinan, Weqfa Jina Azad, çar navndên perwerdeyê vekirin. Herwiha ji bo jinên nexwenda jî çar dewreyên zimanê erebî hatin dayîn. 47 jin tevlî perwerdeya ziman bûn.

Ji bo zarok û jinan weqfê gelek projeye ava kirin. Ji wan projeyan vekirina baxçeyên zarokan li Kobanê, navenda sporê, perwerdeya ragihandinê û vekirina perwrdeya dirûna cilan li navendên weqfê. Herwiha li tevayiya navendên xwe dembidem pêşangeha karê destan li dar dixe. Armanc ew e ku jin di her qada civakê de xwe pêş bixin û xwe nebînin ku di jiyanê de ji bo karê malê tenê ne.

Piştî xebat û serkeftina heft salan, Weqfa Jina Azad ya Sûriyê cara yakê bi durişma "Jina Azad Bingehê Civaka Azad e" 18`ê Hezêrana 2021`ê konferansa xwe li zanîngeha Rojava ya bajarê Qamişlo, li dar dixe.



## Gerîla doza jiyana xwebûnê ye

Gulîstan Xalid

Ya ku jiyana mirov dike xwedîarmanc, pîvan û rêgezan diyar dike, doz e. Doz jî ne meseleyeke fikrî û siyasî tenê ye. Meseleyeke dil û evîndariyê ye. Mirov fikir di mejiyê xwe de dibe û tîne, bi lêpirsînan zelal dike, lê bi dilê xwe pê bawer dike û pê ve tê girêdan. Ji bo dozê bi qasî mejî dil û evîndariyê jî pêwîst dike. Çawa ku destanên evînê ji ber şerê li hemberî dijberiya evînê û têkoşîna di riya wan de hatiye dayîn bûye evîneke destanî, doz jî wisa ye. Dema tu bi dilê xwe pê ve têyî girêdan, çiqas dijber hebin, cîhan tev jî bi ser te de bê û bi şert û mercên zehmet re rûbirû bêyî jî, mirov dev ji dozê bernade.

Îca dema ev doz doza azadiyê be, doza gelekî ku bi salan ji ber zimanê xwe, çanda xwe, erdîngariya xwe bi her cureyê êrîşan re rûbirû hatibe, bi tevayiya siyasetên ku hebûna wê inkar dike û qebûl nake re rûbirû hatibe, wê demê ji bo dozeke wiha mirin ji jiyanê birûmettir dibe. Lewra jiyan ne danûstandina nefesê tenê ye, jiyan xwebûn e, xwebûna xweserbest îfadekirin e.

Mîna gerîllayên ku niha ji bo doza xwe li hemberî artêşa dagîrkeriya dewleta tirkî, li hemberî dewleta 2. Ya NATO li ber xwe dide. Ma her kes dizane ku gerîla teknîka wê ne weke ya dewletê ye. Lê yê gerîla dide şerkirin ne teknîk e, yê ku teknîkê bi afrînerî dide bikaranîna gerîla ye. Ji ber gerîla bi dildarî û dizane ji bo çi li ber xwe dide, dizane ka çi dixwaze, dizane tama jiyana azad û xwebûn çi ye û çawa ye. Doza gerîla doza jiyana xwebûnê ye. Di riya wê de şer dike, li ber xwe dide, afrîner dibe, moralê xwe, baweriya xwe ji hêza doza xwe digire gerîlla. Yê ku di rih û mejiyê xwe de azad dibe afrîner jî dibe. Li wan çiyayê Kurdistanê afrîneriya gerîlla ji vê rastiyê tê. Yanî gerîla ne tenê weke hêzeke ku şer dike, ew hêzeke xwedî fikreke ku pê bawer e, xwedî modêla jiyanekê ye.

Niha artêşa dewleta tirkî ya dagîrker bi tevayiya hêza xwe êrîşî gerîla dike û bi armanca tinekirinê vê êrîşê dike. Em dibînin bê çawa ev artêş li hemberî berxwedana gerîla tengav bûye, lê nema dikare ne gavekî paş de bavêje û ne jî berxwedana gerîla bişkîne. Ev artêşa ku xwe spartiye teknîka xwe ji bê çaretiyê geh çeteyan bi kar tîne geh jî xayînan bi kar tîne, lê dîsa jî li hemberî berxwedana gerîla encama ku dixwaze nikare bigihiyê. Du sedemên vê yê esasî ku artêşa tirkî nikare fam bike hene, yek Ji ber ku ne xwediyê wan çiyayan e, ya duduyan jî gerîla bi vîn û baweriyekê li ber xwe dide û xwdiyê wan çiyayan e, wdiyê doza xwebûnê ne....

# “Ji ber ku xebata Tevgera Azadiyê li dijî desthildaran e, êriş li ser dibin”

Li Zap, Avaşîn û Metîna, ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, ji 23`ê Nîsanê ve, gerîla bi têkoşîneke bêhempa li ber xwe didin. Li ser mijarê Rozelîn Bekir diyar kir ku êrişên li ser Herêmên Parastinê yên Medya dibin, berdawama komploya qirkirina gelê Kurd û tinekirina projeya demokratîk e.

**Dilîn EHMED/Qamişlo**

Endama Meclisa Jinan ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Rozelîn Bekir derheqê vê mijarê de wiha axivî: “Em niha di rojên pir dîrokî re derbas dibin. Piştî berxwedana gelê me û bi saya xwîna şehîdan, em niha li ser xaka xwe dijîn. Lê ji ber ku dewleta tirkî dewleteke dagîrker e, Kurd li kû bi êrişî wan dike. Herî dawî êrişên ser Zap, Avaşîn û Metîna dest pê kirin. Bi van êrişan diyar bû ku dewleta tirkî gelê Kurd bi giştî dike amanca xwe ne partî yan şexsekî. Her kes dizane ku Erdogan ku mirovkî Kurd li ser heyvê konekî jî vede, wê êrişî wî bike. Ji ber wê divê gelê me hişyar be û baş bizane ku dewleta tirkî bi hiceta PKKê êrişî wan dike. Bi taybetî divê gel û hukûmeta Başûr careke din li dîrokê vegerin.”

Rozelîn got, em nikarin inkar bikin, mala Berzanî maleke Kurdî û kevnar e. Li hemberî dijmin gelek şehîd jî dane, lê tişta ku niha xuya dike ew e ku îradeya vê malbetê di destekî de maye.

Rozelîn axaftina xwe wiha domand: “Ev ne cara yekê ye ku dijmin êrişî gelê me dike. Mixabin niha careke din bi desteka hin Kurdên me, careke din dijmin tinekirina gelê Kurd xistiye plana xwe. Em helwesta PDKê ya ku piştgiriya êrişên dagîrkirina Kurdistanê dike layiqê partiyeke kurdî nabînin. Rastiya tevgera azadiyê di êrişên ser Şingalê de li ber çavê tevayiya cîhanê hat dîtin. Yên civaka Êzîdî ji hovîtiya çeteyên DAIŞ`ê rizgar kirî kî bûn? Ma ne ew gerîlayên niha li hemberî êrişên qirkirinê li ber xwe didin bûn? Ti kes nikare vê rastiyê veşêre. Lê ji bo ku Başûr Erdogan razî bike, bi tevayiya hewildanên xwe dagîrkeriya Tirkiyê û êrişê wê rawa dike. Herwiha Başûr li dijî hêza ku xaka wê parastî û diparêze, bûye xencer. Divê gel vê qebûl neke.”

**“DIVÊ KURDISTAN SER HER TIŞTÎ RE BE”**

Derheqê girîngiya avakirina yekîtiya neteweyî de ku demeke hatibû rawestandin, Rozelîn Bekir wiha axivî: “Ji bo avakirina yekîtiya neteweyî li ser banga fermandarê Hêza Sûriya Demokartîk (QSD) Mezlûm Ebdê, em dikarin bêjin heta astekê diylog baş hatin kirin. Hêviya gelê me yê li her çar paerçeyan hebû ku mala me ya kurdî were avakirin. Lê ez vê jî bêjim, ev cihê mixanbiniyê ye ku dewletên derve yên weke Emerîka bêjin divê hûn xwe bikin yek. Xwezî gel û paritiyên me bixwe doza vê bikiran. Wisa xuya dibe ku dijminê me dîroka me baş dixwîne, ji ber wê dizane yên ku Kurdan dişkînin Kurd bixwe ne. Ji ber wê dijmin her tim hewl dide ku diyalogên li ser yekîtiyê bide sekinandin. Lewra berjewendiyên wan di şerê birakuijiyê de ne. Ji ber wê eger em di vê rewşa hesas de yekîtiya xwe ava nekin, emê careke din doza xwe wenda bikin. Ji bo wê divê em gelê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê rabin ser piyan û bêjin; êdî bes e divê em Kurdistana xwe rizgar bikin û ser her tiştî re bigirin.”

**“KAR Û XEPATA WAN JI BO WE YE”**

Rozelîn Bekir got, ev zêdetirî 40 salî ye tevgera azadiyê ji bo parastin û bidestxistina mafê gelê Kurd, têkoşînê dike û li her çar parçeyan jî şehîd dane. Para herî mezin jî niha li çiyayên azad li ber xwe didin. Rozelîn axaftina xwe wiha domand: “Têkoşîn û berxwedana tevgera azadiyê ya bi salan tenê ji bo parastina gelê Kurd e. Bila ti kes xwe nexapîne û nebêje ev tevger ji bo berjewendiyên xwe dike. Êrişên ku niha dijmin li ser gelê me dike, herî dawî êrişên ser Herêmên Parastinê yên Medya pir eşkere diyar dikin ku dewleta tirkî û hevkarên wê qirkirina gelê Kurd xistine plan xwe. Êrişa çekdarên PDKê siyaseta qirêj ya dijminê gelê Kurd e ku dixwaze birakujiyê derxe. Eger Başûr bêje me ji bo parastina xaka xwe êriş kir, em tiştekî nabêjin, lê emê vê bipirsin: Li ser baregehên leşkerî yên dewleta tirkî yên li Başûr, helwesta wan çi ye? Herwiha her kes dizane ku aboriya Başûr jî di destê dewlata tirkî de ye.



Çima Başûr li hemberî dijmin dengê xwe nake, lê li hember birayên xwe bi hêsanî êriş dike? Ev hemû pirs in. Gelo bersiva wan çi ye?”

**“SIYASETA TIRKIYÊ LI BAŞÛR JÎ TÊ BIRÊVEBIRIN”**

Endama Meclisa Jinan ya (PYD) Rozelîn Bekir li ser siyaset û peyamên Erdogan axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Siyaseta ku Erdogan li Tirkiyê bi rê ve dibe, li Başûr jî dide meşandin. Girtina nûnerên Rêvberiya Xweser û PYDê ev eşkere kir. Ev siyaseta dewleta tirkî dimeşîne, ji bo Kurdan pir bixeter e. Divê Başûr hişyar be, armanca Tirkiyê qirkirina Kurdan e, ne ya Partiya Karkerê Kurdistanê tenê ye. Ev di peyamên Erdogan de jî diyar dibe. Çawa ku her tim diêje, şaşîtiya me li bakurê Iraqê kirî emê li bakurê Sûriê nekin. Li gorî ku tê xuyakirin Erdogan hesab dike eger tevgera azadiyê tine bikin, wê Başûr di hefteyekê de tine bibe. Ji bo wê banga me ya sereke û girîng ew e ku, gelê me yê her çar perçeyan, bi taybetî Başûr li hemberî planên dijmin hişyar be û piştgiya gerîla bikin. Lewra yên ku wan ji bindestiyê rizgar bikin ew in.”

## “Parastina Kurdistanê hem erk, hem ferz e”

**Oldaran got, êrişên artêşa tirkî yê dagîrkirina başûrê Kurdistanê û herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê li dijî Islamê û Qurana pîroz in. Herwiha li dijî rêgezên civakî û mirovî ne. Ji ber wê parastina erdê Kurdistanê hem erk, hem ferz e.**

AKP’ê ya bi serkêşiya Erdogan ji dema ku gihiştiya ser desthilata Tirkiyê ve, di sala 2003’yan

**“ERDOGAN BI KIRYARÊN XWE OL REŞ KIR”**

Oldarên ola Islamê gotin, Erdogan bi kiryarên xwe ola Islamê reş kir. Mele Mihemed Berekat (85) ku meleyê mizgefta El-Bûxarî ya bajarê Serê Kaniyê yê dagîrkirî bû û piştî dagîrkirinê koçber bû, got, gelê Kurd gelekî Misilman e, êrişên dewleta tirkî yên ser gelê Kurd li dijî nirx û ola Islamê ne û derexlaqî ne.

Mele Mihemed Berekat axaftina xwe wiha domand: “Naxwazim tiştekî ji Erdogan re bêjim, lê dixwazim vê bipirsim; gelo Qurana pîroz ku Erdogan dixwîne êrişên ser gelê Kurd, Ereb û Suryan qebûl dike? Gelo Erdogan di Qurana pîroz de dîtiye ku êrişî gelên herêmê bike û mal û milkên wan talan bike, wan bikuje, koçber bike û malên wan hilweşîne, xaka wan desteser bike, kesên xerîb di malên wan de bi cih bike.”

Mihemed Berekat got, ez meleyê mizgefta El-Bûxarî ya li Serê Kaniyê bûm, ez ji ber êrişên Erdogan neçar mam dev ji mizgeft, xizim û mal û milkên xwe berdim.

Mele Mihemed Berekat bal kişand ser girîngiya cîhada li dijî Erdogan û got, lewra ew bi kiryar û sûcên xwe zilmê li gelên



herêmê dike. Pêxemberê me jî gotiye cîhada herî baş cîhada li dijî zilmê ye.

Endamê Saziya Kar û Barên Olî û serokê nivîsgeha El-Weqif û Milkan li Tebqayê Şêx Ednan Îd Ilêwî jî got, dewleta tirkî welatên Ereban û Rojhilata Navî 400 salî di binê dagîrkeriya xwe de hişt. Niha Erdogan dixwaze careke din vê dagirkirinê nû bike.

**‘ERDOGAN OLA ISLAMÊ BI KAR TÎNE’**



Ilêwî diyar kir ku Erdogan ji bo ku dagîrkirina xwe li herêmê û welatên Ereban nû bike ola Islamê bi kar tîne û got, ev siyaset dûrî ola Islamê ye. Herwiha eger em li siyaseta Erdogan ya dagîrkirinê binêrin emê bibînin ku ew tijî xirakirin, hilweşandin, kuştin, koçberkirin û hilweşandina binesaziyê ye.”

Di dawiyê de Şêx Ednan Îd Ilêwî bang li tevayiya oldarên Islamê, misilman û oldarên El-Ezher kir ku tişta Xweda gotî, pêk bînin.

***ANHA***

**Ji nêz ve**



### Agirê Başûr, tîn û roniya xwe dide rojavayê Kurdistanê jî.

**Ednan Mustafa**

Ev demek e çavê dinayayê li lûtkeya NATO bû. Di heman demê de her kes li benda hevdîtina Erdogan û Biden bû ka wê ji hevdîtina ku 6 meh in Tirkiye û Erdogan li bendê bû çi derkeve. Gotineke pêşiyên me heye: “Roja Pênşemê ji Çarşemêdiyar e”. Rast e bendewariyek ji vê hevdîtinê hebû, lê herî kêm ji bo me Kurdan kêm zêde me texmîn dikir ka wê encameke çawa derkeve.

Ji 23yê meha Nîsanê ve dagîrkeriya Tirkiyê ku yek ji hevkarên Emerîka û NATO ye, êrîşî başûrê Kurdistanê dike û qanûn û pîvanên navneteweyî binpê dike. Bi navê şerê li dijî PKK’ê dar û beran, dehil û zeviyan dişewtîne û mirovan dikuje. Lê li hemberî vê hovîtiyê di serî de welatên li lûtkeya Cinêvê kom bûyîn, ji ti welatî dengê nerazîbûnê derneketiye. Ji ber wê berî hevdîtina dualî ya Bidenn û Erdogan û piştî wê jî ji bo Kurdan tiştekî were guhertin nîne. Nîşana wê jî daxuyaniya Erdoganê dagirker e ku got, divê hevkarên me di navbera Terorîstên baş û nebaş de ti cudayiyan nebînin, teror her teror e”. Ev hevoka Erdoganê faşîst diyar dike ku mijara her du aliyan li hev kirî mijara tasfiyekirina PKK’ê ye.

Rêvebiriya Emerîka berî lûtkeya NATO, roniya kesk ji Tirkiyê re pê xist ku êrişî başûrê Kurdistanê bike. Lê vê têrê nekir hêzên PDK’ê jî beşdarî van êrişan kirin û rêveberiya Baxdayê bêndeng kir. Lewra ji her kesî ve diyar e ku erdê Iraq’ê di binê serweriya Emerîka de ye. Cihekî serweriya Emerîka hebe li wir alozî û kirîz hene. Ev heqîqet di polîtîkaya Emerîka ya Rojhlata Navî de veşartî ye. Emerîka ji bo bi Îranê re şer neke, sala 2020an hêzên xwe kişandin herêma Kurdistanê. Lê bi hatina Emerîka ya herêma Kurdistanê re aloziya di navbera Kurdan xwebixwe û di navbera Kurdan û Tirkiyê de kûrtir kir. Ji bo wê polîtîkaya Emerîka li hemberî Kurdan ne yek, di zihniyeta desthiladariya Emerîka de Kurdê Baş û Kurdê xirap heye. Ji ber wê li Başûr piştgiriya PDK’ê û YNK’ê dike, di heman cografyayê de rê dide tasfiyekirina PKK’ê. Bi heman siyasetê ve girêdayî behsa hiqûq û edaletê dike. Lê li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê li hemberî qirkirina siyasî, kuştina endamên HDP’ê lîstika sê meymûnann dilîze.

Nêzîkatî û siyaseta Emerîka li bakur û rojhilatê Sûrî û rojavayê Kurdistanê ji polîtîkaya giştî ya Emerîka û NATO ne qut e. Ji vekişandina leşkerî ya Emerîka ji rojavayê Kurdistanê heta betalkirina peymana Şirketa Delta ya Petrolê, diyar dibe ku polîtîkayeke Emerîka ya derbarê Kurdan de nîne. Emerîka bi vê nêzîkatiyê dixweze demê qezenc bike. Li aliyekî hêvî dide QSD’ê ku dibêje; em ji bo aramiya bakur û rojhilatê Sûrî li vir in, li aliyê din ji bo tasifyekirina tevgera azadiyê bi Tirkiyê re peymanên veşartî imza dike.

Di vê çarçoveyê de, dema hevdîtina Erdogan û Biden were temaşekirin û xwendin. fi navbrra her du aliyan de pazara sereke dîsa Kurd bûn. Weke ku rêvebrriya Emerîka ji dagîrkeriya tirkî re bêje, xwe nêzî Rojava neke, lê ji bo te Kurdên perçeyên din tu serbest î. Tu wan dikujî, tine dikî, ew karê te ye.

Lê rastiya gelê Kurd û tevgera azadiyê (PKK) tersê xwendina Erdogan û Biden e. PKK’ê nîşan daye ku Kurd yek beden in. Parçeyek ji bendê biêşe wê laş hemû êşê bikşîne. Di wê weteyê de agirê ku li başûrê Kurdistanê geş dibe, tîn û roniya xwe dide rojavayê Kurdistanê jî. Lewra şîn û şahiyên me jî yek in.



# Armanca gelacan pêk neynin

Li ser hewldana derxistina tevlîheviyê li Minbicê, şêniyên bajarê Qamişlo gotin, divê şêniyên Minbicê fêm bikin ku gelek aliyên derve dixwazin li herêmê bi derxistina tevlîheviyê armanca xwe pêk bînin. Ji ber wê divê li hemberî van hêzan bibin yek.

**Leylan RESO/Qamişlo**

**“BI SIYASETEKE QIRÊJ MILET DIKIŞÎNIN NAVA ŞERÊ BIRAKUJIYÊ”**

Li ser vê mijarê, welatiyê bi navê Mehmûd Ebas wiha axivî: “Ez van bûyerên dawî yên li bajarê minbicê dibin şermezar dikim. Di vê rewşa zehmet ya em tê de, li milekî êrişên dewleta tirkî, li milekî jî siyaseta rêjima Şamê û hin dixwazin di nava gelên me de nakokiyan derxin. Bi siyaseteke qirêj dixwazin di nava gelan de şer derxin. Bi sedê salan e em bi tevayiya gelan bi hev re dijîn. Divê gel derbarê siyaseta dewleta tirkî de şiyar bin.”

**“PAŞROJA HELÊ ME HEVBEŞ E”**

Ebas di dewama axaftina xwe de wiha got: “Têgîna jiyana bi hev e di nava gelan de ji mêj ve heye. Lewra gel bi hev re dijîn. Li welatekî her guherîn erênî bandorê li gelan dike. Gelên herêmê li ser yek erdnîgariyê dijîn û çarenûsa wan hevbeş e. Herwiha daxwaziya wan ya hevbeş di nava aştiyê de paşrojeke biewle, aram, azad e.

Ebas axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: “Di rewşa heyî de divê li hemberî komployan em şiyar bin da em bikarin li ser bingehê çanda aştî û heskirinê pergala xwe ava bikin.”

**“ARMANCA DEWLETA FAŞÎST BINXISTINA GELÊ BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ YE”**

Li ser mijarê ciwanê bi navê Şihab Evdikê (23) jî nêrîna xwe wiha diyar kir: “Bûyerên li Minbicê bûyîn plankirî ne û bi desteka dewleta tirkî ya dagîrker



pêk hatine. Armanca wê binxistina gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, derxistina nakokiyan di nava gelên wê de û astengkirina demoqratîk biçewisîne û nehêlê pirojeya rêveberiya xweser ya netewa demoqratîk bi ser bikeve.”

**“DIVÊ GELÊN ME HIŞYAR BIN”**

Şihab got, bûyerên herî dawî yên li minbicê, zererên madî û canî dan. Di wê demê de gelek kes birîndar bûn û hin jê mirin. Ev ciyê şermezarkirinê ye. Dive gelên me hişyar bin ku ev êriş bi desteka dewletên mezin û rêjima Sûriyê ye.

## Rojnamevanan bang li partyên Başûr kir

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Rojnamevanên Germiyan peyama Murat Karayilan ya ji bo aştî û yekîtiya Kurdan girîng dîtin û bang li partîyên Başûr kirin ku vê peyamê cidî bigrin.


Fermandarê Biryargeha Navendî ya Parastina Gel Murat Karayilan, 10’ê Hezîranê di Strêrk Tv de, têkildarî êrişên dagîrkeriya Tirkiyê ya li başûrê Kurdistanê, hewldan û provakasyonên PDK’ê yên li Metîna axivî bû. Karayilan dîyar kiribû ku li Metîna metirsiya di navbera wan û PDK’ê de pevçûn derkeve heye. Ji bo şer dernekeve bang li aliyên siyasî, rêxistin, rewşenbîr û hunermendên her çar parçeyên Kurdistanê kir ku bêdeng nemînin û rê nedin şer di nava aliyên kurdî de derkeve.

Rojnamevanên Germiyan, têkildarî vê banga Karayilan ji ajansa nûçeyan Rojnewsê re axivîn û wiha bang li partîyên Başûr kirin: “Şerê Kurdan yê navxweyî armanca Tirkiye ye. Em daxwaziyê ji partiyên başûrê Kurdistanê dikin, ku peyama Murat Karayilan cidî bigrin. Herwiha divê PDK jî li ser vê peyamê xwe li ber çavan re derbas bike.”

Rojnamevan Rênas Salih bal kişand ser armanca dewleta tirkî û wiha got: “Dewleta tirkî ya dagîrker, bi xeyalên Osmaniyan dixwaze başûrê Kurdistanê dagîr bike û bike beşek ji xaka xwe. Herwiha dest daniye ser aborî û siyaseta herêma başûrê Kurdistanê. Pirsgirêk ew e ku hin kes rê ji vê dewletê re xweş dikin. Gelo çawa tirsa dagîrkirina walat nakeve dilê wan!”

Rênas têkildarî peyama Karayilan ya ji bo hêzên kurd jî wiha got: “Peyamek girîng bû






û di dema xwe de bû. Pêwîst e aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê xwedî peyamên mîna wê bin. Dibe hinek rêveberên siyasî yên herêmê biryara şerê birakujiyê dabe. Lê divê bandora vê peyamê li ser wan çêbe û li gorî wê xwe di ber çavan re derbas bikin. Her kes dizane ku armanca vî şerî dagîrkirina Kurdistanê tevê ye û dijmin dixwaze vê bi şerê Kurd û Kurdan bike.”

Rênas Salih, zimanê hinek siyasetmedarên Herêma Kurdistanê yê li dîjî PKKê ku ji bo dagîrkeriya dewleta tirkî dibe piştgirî rexne kir û got, nabe were gotin ‘PKK li başûrê Kurdistanê çi dike, bila çalakiyên xwe bibe Bakur.’ Lewra ji bo PKKê ferq di navbera Bakur û Başûr de nîne, li her çar parçeyên Kurdistanê, ji bo neteweya Kurd xebatê dike.

Rojnamevan Ehmed Hemîd jî bal kişand ser armanca Tirkiyê û wiha axivî: “Armanca êrişên dewleta tirkî li her devera Kurdistanê ew e ku statûya Kurdan ya li her cîhî ji holê rake. Herwiha dixwaze vê bi rêya têkdana nava Kurdan bixwe pêk bîne ku van êrişên xwe yên hovane rewa bike. Lewra li kû Kurdek dibe ser lingê xwe, ew hema hewla tinekirinê dike.”

Herwiha Ehmed Hemîd jî bal kişand ser girîngiya peyama Karayilan û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Girîngiya peyama birêz Karayilan pêwîstiya lihevkirina partiyên kurdî bû û bi zimanekî nerm diyar kir ku divê bi hevdîtinan nakokiyên heyîn bên çareserkirin. Divê ji aliyê PDKê ve jî, bi heman şêwazî heman peyam hebe. Da lihevfêmkirin çêbe û gav ji bo dawîanîna aloziyan were avêtin.”

***Çavkanî: Rojnews***



### ÇIMA QENDÎL?

**Faruk SAKİK**

Serokê HSK’ê Mihemed Hacî Mehmûd di konferansekê de, di axaftina xwe de digot, ev bû 25 sal li wê herêma Qendîl dijmin nîne, hêza Be´es nîne. Ji bo çi pêşmerge niha here wê derê û xwîna birayên xwe birijîne? Hewce nake. Jixwe PKK, PDK û YNK’ê li hev kirin û biryar dan ku gerîla li Qendîlê bi cih bibe.”

Ev bersiva ku gerîla çima li Qendîlê ye. Lê gelek sedem hene ka gerîla çima hat van deveran û îro çima li van deveran li dijî dijminê Kurdan şer dike.

Na... emê mînaka, sala 1877’an dema şerê Rûs û Osmaniyan, hêzên Rûs hewl dan êrişî Kurdên herêma Serhedê bikin, Şêx Ubeydullah Nehrî bi hawara wan ve çû nedin. Dema êrişa Îran û Ingilîzan, Şêx Mehmûd ji bajarê Silêmaniyê derbasî rojhilatê Kurdistanê bû û Kurdên vê beşa welat, ti carî Şêx Mehmûdê Berzencî ji bo xwe weke bar nedît û jê re negotin çi karê te li herêma me heye. Na...Emê vê mînakê jî nedin.

Li hemberî êrişên Îran û dewleta tirkî, Simko berê xwe da bakurê Kurdistanê û ji aliyê gelê vê beşê ve hat himbêzkirin. Yanî Kurdên Bakur ji bo têkbirina tevgera Simkoyê Şikakî nebûn hevkarên Tirkiye û Îranê. Belê...Em vê mînakê bi bîra PDK’ê bixin.

Li dadgeha Îranê, dema pirsa çi karê Mele Mistefa Barzanî li vir heye ji Qazî Muhemed hat kirin ev bersiv da: “Kurdistan, mala her Kurdî ye. Em baş dizanin, bav û bapîrên we, ji we re bersiva Qazî gotibûn, lê we ev bersiv ji bo berjewendiyên xwe yên malbatî ji bîr kiribû.

Dîsa Kurdên bi pêşengiya Mele Mistefa Barzanî dema li ber rêjima Iraqê rabû, Bakur, Rojava û Rojhilat bûn wargehên pêşmergeyan. Û wê demê ti hêza Rojhilat, bi gotina “hebûna te zererê dide pêwendiyên me û Iraqê” zor li Mele Mistefa nekirin.

We dît PDK...? Ti kes weke we tev negeriyaye.

PKK ne tevgereke bakurî tenê ye. Rast e ji Bakur dest pê kir, lê bi demê re bû tevgereke kurdistanî. Ji her devera Kurdistanê Kurd hatin di nava vê tevgerê de cih girtin. Bûn gerîla û li derveyî herêma xwe jî şer kirin. Ji başûr hatin li Bakur şehîd bûn. Hin kes jî hatin li Başûr bi cih bûn. Li herêma Qendil, Avaşîn, Xakurk, Zap û Metîna bargehên xwe ava kirin.

Û em derbasî bersiva çima gerîla li vê heremê ye, bibin.

Emê rastiya ku PKK mafdar e li her devera Kurdistanê bargehên xwe ava bike, PKK ji bo azadiya Kurdistanê têdikoşe, daynin aliyekî. Lê rastiyeke din heye. Ev herêm ne xaka bavê ti kesî ya tapokirî ye. Ev xak, xaka gelê Kurd e. Ev xak, xaka Diyar Xerîb, Vîyan Soran û bi hezaran gerîlayên ji Başûr e jî. Ev xak, xaka bi hezaran şehîdên ji vê heremê ne jî.

Baş e...yên ji parçeyên din ji vê heremê vekişiyan, hûnê ji gerîlayên Başûr re statûyeke çawa bibînin? Hûn dibêjin bila her kes li herêma xwe têbikoşe. Ahaa.. Hevalê Diyar Xerîb jî dixwazin li herêma xwe şer bikin. Hûn çima dibin asteng? Hûn van baş dizanin, lê dijminê Kurdan van rastiyên dîrokî ku me li jorê mînak dan û rastiya PKK’ê ji we xwestin ku hûn jî bîr kin. Bi DNA’yê we lîstin. Yan jî ku wisa nebûya anha peşmerge di dest de çek di tabûra Diyar Xerîb de li dijî dagîrkeriya dewketa tirkî şer dikir. Rêveberiya hikûmeta Başûr jî wê serî li Neteweyên Yekbûyî bida bigota “çi karê artêşa dewleta tirkî li ser xaka me heye.”

Ji bo vê yekê ti kes nikare bibêje, PKK û gerîla çima li herêma Başûr in.